**KT**

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TİRKIYEYÊ**

**ŞAXÊ MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE ANALÎZA QEWLÊRKÊN EVÎNÎYÊ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ(Çaylarbaşi/SÎVEREK)

**Ahmet SORUCÎ**

**22721115**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Necat KESKİN**

**Mêrdîn-2023**

**KT**

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TİRKIYEYÊ**
**ŞAXÊ MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE ANALÎZA QEWLÊRKÊN EVÎNÎYÊ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ(Çaylarbaşi/ SÎVEREK)

**Ahmet SORUCÎ**
**22721115**

**Şêwirmend**
**Doç. Dr. Necat KESKİN**

**Mêrdîn-2023**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisans Üstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Ji Aliyê Teşeyê ve Analîza Qewlêrkên Evînî yên Gundê Herheriyê (Çaylarbaşı/Siverek)" adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektironik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye"de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylıyorum. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.

- Tezimin/Projemin  yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

20.01.2023

Ahmet SORUCİ

# KABUL VE ONAY

Ahmet SORUCİ tarafından hazılanan *"**Ji Aliyê Teşeyê ve Analîza Qewlêrkên Evînî yên Gundê Herheriyê (Çaylarbaşı/Siverek)**"* adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **TEZSİZ YÜKSEK LİSANS PROJESİ** olarak oybirliği/oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Necat Keskin (Danışman)

.......................................................................................................................................

Doç. Dr. Mustafa Öztürk (Üye)

…………………………………………………………………………………………

Doç.Dr. Mustafa Aslan (Üye)

…………………………………………………………………………………………

Doç. Dr. Ahmet Kırkan

Enstitü Müdürü

# KURTE

Em di vê xebatê de li ser yek ji cureyên edebiyata devkî rawestiyan ku ew jî *delal* in ku bi gelemperî ev helbestan re ewlêrk tê gotin. Qewlêrkên hatine berhevkirin ji gundê Hêrhêriya Sêwregê ye ku navê wê ya fermî Çaylarbaşi ye. Me di vê xebatê de xwest ku qewlêrkên vî gundî were tomarkirin û ji alîyê teşe û naverokê ve were hilsegandin. Bi vî hawî me armanc kir ku mînakên vê cureyê were qeydkirin.

Ev xebat ji destpêkek, sê beş û encamekê pêk tê. Di beşa yekem de wek cureyeke edebiyata devkî qewlêrk hatiye nasandin. Di beşa duyem de qewlêrkên ku hatine berhevkirin, hatine nivîsin. Di beşa dawî de jî qewlêrkê berhevkirî ji alîyê teşe û naverokê ve hatine hilsegandin. Di encamê de hat dîtin ku ev qewlêrk ji alîyê teşe û naverokê ve taybetîyên cureya qewlêrkê dihewînin, bi hêma û mijarên xwe raman û hestên gelê kurd nîşan didin.

**Bêjeyên Sereke**: Edebiyata Devkî, Qewlêrk, Sêwreg, Hêrhêrî, Kurdî.

# ÖZET

Bu çalışmada sözlü edebiyat ürünlerinden mani üzerinde durduk. Derlenen maniler Siverek'in bir köyü olan Herheri'den derlenmekle beraber bu köyün resmi adı Çaylarbaşı'dır. Bu çalışmada bu köyün manilerinin derlenmesi ve bunların biçim ve içerik yönünden değerlendirilmesi istenmiştir. Böylece bu türün örneklerinin kaydedilmesi amaçlanmıştır.

Bu çalışma bir giriş, üç ana bölüm ve bir sonuç kısımlarından oluşmaktadır. Birinci bölümde bir sözlü edebiyat ürünü olan mani türü tanıtılmıştır. İkinci bölümde derlenen maniler yazılmıştır. Son bölümde ise bu maniler biçim ve içerik yönünden incelenmiştir. Sonuç olarak derlenen bu manilerin biçim ve içerik yönünden mani türünün özelliklerini içerdiği, sembol ve konu bakımından Kürtlerin fikir ve duygularını yansıttığı görülmüştür.

**Anahtar Kelimeler**: Sözlü Edebiyat, Mani, Siverek, Çaylarbaşı, Kürtçe.

## ABSTRACT

In this study, we focused on mania, one of the oral literature products. Although the compiled manis were compiled from Herheri, a village of Siverek, the official name of this village is Çaylarbaşı. In this study, it was requested to compile the manis of this village and to evaluate them in terms of form and content. Thus, it is aimed to record specimens of this species.

This study consists of an introduction, three main chapters and a conclusion. In the first part, the type of mania, which is a product of oral literature, is introduced. In the second part, the compiled poems were written. In the last part, these manias were examined in terms of form and content. As a result, it has been seen that these compiled manis contain the characteristics of the mani type in terms of form and content, and reflect the ideas and feelings of the Kurds in terms of symbols and subjects.

**Keywords**: Oral Literature, Mani, Siverek, Çaylarbaşı, Kurdish.

# PÊŞGOTIN

Beriya nivîsê mirovan babetên wek mît, çîrçîrok, çîrok, helbest û cûreyên helbestê yên wek qewlêrk, stran, lorik, zûgotinok bi devki anîne zimên. Lewma gava meriv behsa edebiyata gelêrî dike metnên van babetan dibe mijara yekem. Gelê kurd jî herwekî gelên din di van waran de berhem afirandine û di civatê de vegotine. Edebiyata gelêrî ya kurdan ji alîyê babetan ve gelek dewlemend e. Herçiqas hinek ji vê xizneya veşartî bi rêya xebat û lêkolînên berhevkirinê derketibin holê jî mixabin diyar e ku gelek ji van berheman ji ber ku nehatine nivisandin winda bûne. Ji aliyê din ve di navbera berhemên devkî û warê afirandinên wan de têkiliyên xurt hene. Ji berheman bêhnên herêmî tên. Ji hilbijartinan peyvan heya mijara berheman taybetiyên herêmî di nav cureyên edebiyata devkî de xuya dikin.

Gelek hestên meriv yên wek xewn û xeyal, hezkirin, xemginî, kul û keser, bêrîkirin, nifir û dia di qewlêrkan de cih digirin. Meriv di çend risteyên kurt de dixwaze hemû hestên xwe der bike. Lewma tê dîtin ku di qewlêrkan de hest naverokê diyar dike. Bi gotineke din kesên ku dixwazin hestên xwe bînin zimên ji cureya qewlêrkê sûd werdigirin. Ji ber vê yeke bala vê xebatê digel teşeyê li ser naverok û hestên vê cureyê ye ku di pêvajoya afirandina gel de hêmana yekem e. Bi vî hawî me xwest ku li ser qewlêrkên ku li gundê Hêrhêriyê tên vegotin, berhev bikin û ji alîyê teşe û naverokê ve tehlîl bikin. Seheya vê vekolînê gundê Hêrhêrî ye ku ev gund biqasî 35 km dûr e ji Sêwregê. Gund di nav sînorên Semsûr û Rihayê de ye. Loma meriv dikare bibêje ku digel çanda Sêwregê, çanda Semsûrê jî li ser şênîyên gund tesîrdar e. Berîya avabûna bendava Ataturkê ava çemê Ferêt zêde gur nebû û gundî ji bo hacetên malê zêdetir diçûn navçeya Sêmsûrê a Kolikê. Li hawirdorê gundekî biqasî Hêrhêrîyê mezin tuneye. Gelîyê gund ji çend malbatên mezin pêk tên û her çiqas şênîyên gund ji eşîrên cûrbicûr bin jî zêdetir xwe bi eşîra Bucaxî ya ve girêdidin. Di dewra Osmanî de navê gund wek "Herheri" derbas dibe.[1] Piştî avabûna Komara Turkiyeyê navê gund hat guhertin û bû Çaylarbaşi û li herêmê zêdetir bi vî navî tê nasîn, lê tê dîtin ku di qerta nifusê ya mirovên salmezin de li cihê zayinê navê Herheri hatiye nivîsin.[2] Gund ji bo ku av lê heye ji aliyê dar û ber ve

[1] Tahir Sezen, Osmanlı Yer Adları, T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü Yayın No: 26, 2. Baskı, Ankara 2017, r. 345.

[2] Bnr. **Wêne 1.**

dewlemend e. Gel piranî debara xwe bi çandinîyê dike. Di demên berê de xwedîkirina heywanan jî di nav xebatên aborî de xwediyê cihekî mezin bû lê niha aborî zêdetir li ser milê çandinîyê ye. Gel bi zaravayê kurmancî qise dike lê li gundên cîran zaravayê dimîlkî jî tê qisekirin. Ev yek dibe sebeba vê yekê ku qewlêrkên tên vegotin bêhtir têkildarî gund be. Li gund kesên ku qewlêrkan vedibêjin jin in. Ji ber ku têkiliyeke danûstandinê çênebûye di navbera jinên kurmancîaxêv û jinên gundên cîran ên dimilîaxêv de tê dîtin ku qewlêrkên hatine vegotin, ne bi bandora cihekî din bereksê wê bi tevahî vegotinên resen ên vî gundî ne. Loma me xwest ku em xebata xwe tenê li ser vî gundî bikin. Ji bo vê yekê bi rêya lêkolîna sehayî û hevdîtinan ev metin hatine berhevkirin. Kesên jêderk ji alîyê temenê ve kesên salmezin in û herwiha ji alîyê civatê ve kesên pêbawer in. Me di vê xebatê de armanc kirin ku xwe bigihênin qewlêrkên resen ên ku di nav gel de bi awayekî devkî dihatin vegotin. Lewma ev xebat tenê li ser qewlêrkên devkî radiweste. Ji kesên jêderk pirsên li jêrê hatiye pirsîn da ku hemû alîyên vê cureyê derkeve holê:

1. Li herêmê navê vê cureyê çi ye?
2. Kêngê qewlêrk dihatin vegotin?
3. Kî *delalan* diafirîne?
4. *Delal* strankî ne an helbestkî ne?
5. Mijarên *delalan* çi ne?
6. Li ku derê *delal* dihatin vegotin?
7. Dema *delal* tên gotin wek bersiv yeka din jî tên gotin?
8. Di afirandinê de pêvajoyeke nivîskî heye?

Di vê xebatê de me daxwaz kir ku bi rêya van pirsan hin qewlêrkan bînin bîra wan kesan. Çinku tê zanîn ku berhemên devkî wexta neyên gotin bi demê re tên jibîrkirin. Me bi rêya hin pirsên din jî xwest ku hevdîtinên ku pêk tên bi awayekî sohbetane derbas bibe da ku kesên jêderk rehetir tevbigerin û bi hestiyarî van qewlêrkan vebêjin. Mînakên qewlêrkan ku ji kesên jêderk hatine wergirtin, bêyî mudaxeleya zimên, bi ziman û devoka wê kesê hatine nivîsin, bi gotineke din qewlêrkên hatine qeydkirin, wexta derbasî nivîsê bûn ji alîyê rêziman û zimanê standart ve nehatine sererastkirin. Di tomarkirinê de hin

zor û zehmetî derketin holê. Ya yekem ew bû ku qewlêrkên evînî yên ku di demên berê de dihatin vegotin, nedihatin bîra kesên jêderkan. Herwiha hin kesên jêderk ji ber ku mijar qewlêrkên evînî bû, fedî dikirin ku van qewlêrkan vebêjin yan jî ji wan hinekan mirazê wan bi lehengê delalê wan re ne bibû, nedixwestin navên wan derbasî nivîsê bibe.

Ev xebata me ji bilî destpêk û encamê ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de em li ser pênaseya qewlêrkê û taybetiyên wê rawestiyan. Di beşa duyem de *delalên* ku ji gundê Hêrhêriyê hatine berhevkirin, hatine nivîsîn. Di beşa sêyem de *delalên* berhevbûyî ji alîyê teşe û naverokê ve hatine hilsegandin. Ji bo ku ev xebata bi vî rengî dawî bibe û em bigihîjin armanca xwe bi sebr û îlma xwe rêya me zelal kir ez sipasiya xwe pêşkeş dikim ji bo cenabê Doç. Dr. Necat Keskinî. Herwiha ez têm destê dayika xwe Naîle SORUCÎ ji ber ku bi saya serê wê ev *delalan* derbasî nivîsê bûn û ji windabûnê hatin parastin.

**Ahmet SORUCİ**

**Mardin-2023**

# NAVEROK


**TAAHHÜTNAME ........ i**

**KABUL VE ONAY ........ ii**

**KURTE ........ iii**

**ÖZET ........ iv**

**ABSTRACT ........ v**

**PÊŞGOTIN ........ vi**

**NAVEROK ........ ix**

**DESTPÊK ........ 1**

Mijara Xebatê û Sînorên wê ........ 1

Armanc û Girîngiya Xebatê ........ 1

Rêbaz ........ 2

Pirsgirêkên Em Lê Rast Hatin ........ 2

**BEŞA YEKEM ........ 3**

**PÊNASEYA QEWLÊRKÊ Û TAYBETIYÊN WÊ ........ 3**

**BEŞA DUYEM ........ 6**

**QEWLÊRKÊN EVÎNÎYÊ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ (Çaylarbaşi/Siverek) ........ 6**

**BEŞA SÊYEM ........ 18**

**JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE ANALÎZA QEWLÊRKÊN EVÎNÎ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ ........ 18**

**ENCAM ........ 20**

**ÇAVKANÎ ........ 21**

**LÎSTEYA KESÊN JÊDERKAN ........ 22**

***PÊVEK ........ 23***

# DESTPÊK

## Mijara Xebatê û Sînorên wê

Me di vê xebata xwe de xwest ku em li ser *delalên* gundê Hêrhêrîyê rawestin. Ji bo ku ev xebata me û sînorên wê bên diyarkirin ez dixwazim behsa peyva *delal* bikim. Her çiqas di edebîyata gelêrî de ji bo ev helbestên ku min berhevkirine re bi gelemperî *qewlêrk* tên gotin, her weha li gor herêman çend navên wan yên weke qewlêrk, dûrik, şaxiste  hebin jî di lîteraturê de ez rastî cûreyekî wek serbixwe ku jê re *delal* tê gotin  nehatim . Loma ji bo ev helbastan binavkirina  *delal* xwedî cihekî taybet e. Herweha stranên berbûkê tên strandin li gund û xwedî cihekî fireh bin jî, ji ev helbestan re tu kes nabêje *delal* navê van *Heval* in. Ji bo ku helbest bibe *delal* divê ku mijara wê evîn be û jê bêhna êş, kol û kesera evînê were. Ev xebatê de tenê helbestên ku jê re *delal* tên gotin bûye mijarDi beşa yekem a vê xebatê de li ser pênaseya qewlêrkê hatiye sekinîn. Beşa duyem li ser mînakên vê cureyê ye ku ji gundê Hêrhêrîyê hatine tomarkirin. Di beşa sêyem de qewlêrkên berhevbûyî ji alîyê teşe û naverokê ve hatine bidestgirtin.

## Armanc û Girîngiya Xebatê

*Delal* ji aliyê teşe û naverokê ve ji qewlêrkan ne cudatir in. Lê herêma ku ev helbestana hatine tomarkirin ji peyva qewlêrkê re biyanî ne. Ev gundê ku me ev helbestana lê berhev kir girêdayî Sêwregê ye û di navbera Sêwreg, Kolik û Rihayê de cih digire. Ev herêm ji alîyê çand û zimanî ve digel taybetîyên herêma Sêwregê, yên Kolikê jî di nava xwe de dihewîne. Ji alîyê ziman û çandê ve herçiqas devoka kurmancîya Berferêt û çanda Kolikê serdest be jî, bandora bajarên cîran jî li ser wê karîger in. Loma mirov dikare bibêje ku ev gund ji alîyê lêkolînê ve dikare cihekî sûdewar be. Digel van yekan tê zanîn ku berhemên devkî yên gel bi pêşketina teknolojîyê û bi bandorên bişavtinê her ku diçin ji nava gel winda dibin. Me jî di vê xebata xwe de xwest ku yek ji cureyên berhemên edebiyata devkî ji windabûnê biparêzin û li ser lîteratura kurdî zêde bikin.

Bi deme re berhemên edebiyata devkî hêdî hêdî ji holê radibin. Ji bo ku gel xwe nas bike, taybetîyên xwe bizanibe, çand û zimanê xwe ji windabûnê bipareze berhevkirin, nivîsandin û hilsegandina van berheman girîng e. Bi vê armancê me ji gundekî bi navê Hêrhêriyê, ku girêdayî navçeya Sêwregê ye, mînakên *delalan* berhev kirin.

**Rêbaz**

Me van *delalan* bi rêya cihaza qeydê ya dengan qeydkir, piştre guhdarî kir û derbasî nivîsê kir. Devê jêderkê peyv çi awayî derket me bi ev rengî derbasa nivîsê kir. Me xwest ku taybetiyên devkî yên herêmê bên paraztin.

**Pirsgirêkên Em Lê Rast Hatin**

Kesên ku di ramana wan de ev qewlêrkan veşartî bûn kesên ku temenê wan derûdora 70 salî bûn. Loma hemû helbest hevdîtinekê de nehatin bîra wan loma em çend caran çûn gund û li van kesan bûn mîvan. Ya di pîrekan gava delal dixwandin şerm dikirin, qeydkirina deng şerm zêdetir dikir. Û çend jina hevditina me veto kir û nexwastin ev delalan bên. Li gor jêderkekê ev kesên ku delal afirandine negihîştine mirazê loma dibe ku ji bo wê nexwastibin delalan bixwînin.

## BEŞA YEKEM

## PÊNASEYA QEWLÊRKÊ Û TAYBETIYÊN WÊ

Di lîteratura kurdî de gelek nav li vê cureyê hatiye lêkirin: qewlêrk, dûrik, xerîbî, lihevanîn, eware, qulîlîrk, sêxiştî û hwd. [3]Di kitêba Yaşar Kaplanî ya bi navê *Kaniya Stranan* de qewlêrk/dûrik wek formake stranan tê nîşandan ku li gorî wî staranên dawet û dîlanan in. Stranên bi vî hawî ji alîyê stranbêjan ve tên gotin û ji alîyê hinek stranbêjên din ve jî tên vegêrandin. Li ber van stranan govend tê girtin.[4]

Çiya Mazî di pirtûka xwe ya bi navê *Baxek Ji Folklora Kurdî* de li ser cureyên edebiyata devkî ya herêma Mêrdînê disekine û li gorî wî dûrik(qewlêrk) *bi piranî di dawetan de tên gotin û bi piranî jî li ser bûk û zavê tên gotin. Dîsa bi piranî dema berbûkên ku diherin bûkê bînin tê gotin.*[5]Mazî, qewlêrkan di nav urf û adetên zewacê de dinirxîne û herwiha alîyên wê yên rexneyî digire li ber çavan. Li gorî wî, qewlêrk yan ji bo rexneyê yan jî ji bo derbirîna ramanekê tên vegotin. Rexneyên li ser bûk, zava, xezûr yan jî xesû di qewlêrkan de tê dîtin.[6]

Li gorî Kafur Seçilmek, qewlêrk, helbestên gel ên anonîm e. Bi rêya qewlêrkan gelek tişt tên vegotin û gelek babatên wê hene.[7] Di ferhenga *Saziya Zimanê Tirkî*(Turk Dil Kurumu) de madeya qewlêrkê wisa ye: *Ew helbesta gel e ku bi gelemperî risteyên yekem, duyem û çarêm bi serwa ne û bêhtir bi kêşa heft kiteyî ne.*[8] Digel van pênaseyan Necat Keskin, pênaseya vê cureyê wisa dike: *Dûrik cureyeke helbesta gelêrî ye ku mijarên wan curbicur in.*[9]Herwiha ew vê cureyê di bin du binbeşan de bi dest digire: a) dûrik/qewlêrk, b)sêxiştî.[10]

---

[3] Necat Keskin, Folklor û Edebiyata Gelêrî, Weşanxaneya Avesta, Çapa Yekem, Stembol, 2019, r.279.

[4] Yaşar Kaplan, Kaniya Stranan, Weşanxenaya Nûbiharê, Çapa Yekem, Stenbol, 2015, r.

[5] Çiya Mazî, Baxek Ji Folklora Kurdî, Weşanxaneya Berbang, Çapa Yekem, Stenbol, 2014, r. 13.

[6] Hb, hr.

[7] Kafur Seçilmek, Edebîyatê Fekkî Yê Kirmanckî(Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi,Weşanxaneya Rûpel, Çapa Yekem, Stenbol, 2019, r. 48.

[8] Türk Dil Kurumu, Türkçe Sözlük, “mani” maddesi, 10. Baskı, TDK Yayınları, Ankara, 2005, s.1340.

[9] Necat Keskin, hr.

[10] Hb, hr.

Li pênaseyên jorê jî tê dîtin ku du alîyên qewlêrkan derdikeve pêşberî me: yê yekem alîyê wê yê teşeyî ye ku li ser kêş, serwa û teşeya serwayan radiweste, yê duyem jî li ser naverokê ye.

Ji alîyê teşeyî ve qewlêrk bi gelemperî ji çar risteyan pêk tên lê yên ku ji sê risteyan pêk tên jî hene. Serwa hêmana bingehin a vê cureyê ye, herwiha wexta tên vegotin ahengeke muzîkî ji wan der tê. Teşeya serweyan a qewlêrkên bi vî rengî ne:

| | | |
|---|---|---|
| --------a | | --------a |
| --------a | | --------a |
| --------a | an jî | --------b |
| --------a | | --------a/b[11] |

Ji alîyê naverokê ve gelek mijar di qewlêrkan de cih digirin. Dûrik/ qewlêrk di dawetan de, di komên jinan de, di xebatên cotkariyê de, di kar û şixûlên wekî din de; ji derbirîna derdan, ji bo balkişandinê , ji bo kêf û xweşiyê û ji bo avêtina berhev (diberhevreavêtin) tên gotin.[12]

Bi kurtî em dikarin taybetiyên qewlêrkan wisa rêz bikin:

- Qewlêrk helbestên gelêrî yên melodîk in ku bi gelemperî ji çar risteyan pêk tên. Yên ku ji sê risteyan pêk tên jî hene.
- Qewlêrk bi serwa, kêş û şemaya serwayan formeke serbixwe ye.
- Qewlêrk di kêlîyên cuda de bi armanc û fonksiyonên cuda tên vegotin.
- Di gelek demên cuda de qewlêrk tên vegotin. Wek mînak di dema rojîyê de, di bûkanînê de, di derkirina hest û ramanan de.
- Qewlêrkên evîndariyê,yên mêrxasîyê, yên kar û pîşeyan, yên rexneyê, yên dînî û hwd. hene. Ev jî dide diyarkirin ku ji kul û keseran heta kêf û şahîyê di hemû rewşên mirovî de qewlêrk bi erkên xwe cih digirin.

[11] Hb, r.279-280.
[12] Hb, r.281.

- Di qewlêrkan de taybetiyên wî gelî veşartî ne, mirov dikare bi rêya wan resenetiya wî gelî nas bike. Digel fikr û ramana gel, mirov dikare hestên wek hêvî, hezkirin, hesûdî, evîndarî û hwd. ya gelekî bibîne.
- Qewlêrk ji alîyê civakî, derûnî, sîyasî û çandê ve xwedî gelek erkan in. Ji alîyê civakî ve qewlêrk di dema kar û şixûlan de yekitiya komê saz dike, ji ber vê yekê ew kar û şixûl bi hêza komê hêsantir çêdibe. Ev yek aîdîtî saz dike di her endamê komê de. Bi vê yekê kes xwe parçeya wê civatê dibîne û şad û bextewar dibe. Herwiha bi rêya rexneyan alîyên nebaş ên kes an komê di hin qewlêrkan de tên nîşandan. Ev yek jî dike ku kes an civat hay ji kêmasiyên xwe hebe û wan çareser bike. Ji alîyê derûnîyê ve kesek bi rêya vegotina qewlêrkan demên xweş derbas dike. Bi kêf û zewq pêdivîyên xwe yên xweşderbaskirina wextê bi dest dixe. Herwiha bi rêya derbirîna kul û keseran rewşa xwe ya derûnî vedibêje. Ev yek nahêle ku di zikê wî kesî de ev kul û keser hêlîn çêbike. Herwiha bi saya qewlêrkan agahiyên bav û kalan derbasî nifşê nû dibe. Bi vî hawî çand xwe diparêze. Hin caran saziyên civakî erka xwe ji zargotina gel werdigirin. Qewlêrk jî yek caran dibe peydakera urf û adetên civakî yên ku bi desthilatî ve têkildar in.

# BEŞA DUYEM

## QEWLÊRKÊN EVÎNÎYÊ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ

## (Çaylarbaşi/Siverek)

Di vê beşê de emê li ser taybetiyên qewlêrkên ku me li gundê Hêrhêriyê berhev kirine bisekinin . Qewlêrkên ku li jêrê ne hemû tenê ji gundê Hêrhêriyê hatine tomarkirin. Di lîteraturê ji bo ku peyva *qewlêrkê* tê bikaranîn me ev peyva bikaranîbe jî li herêmê ji bo qewlêrkan du peyv tê bikaranîn: *delal, heval.*

***Delal:***

Qewlêrkên mijara wan evin û hezkirin in. Ji aliyê qîz û jinan ve tê gotin. Ev helbestan de hestên evînê wek durî, kol, êş û jana dil hemû hene.

***Heval:***

Bi gelemperî qewlêrkên berbûkanin. Şevên hinnê jinên ji malbata zavê û bûkê bi şêwaza strankî helbesta davên ber hev û navê ev qewlêrkan *heval* ***in.*** Heval ji aliyê teşeyê ve dişibin *delalan* . *Heval* zêdetirîn bi strankî tên gotin û li gor mijarê şêwaza wan diguhere. Loma meriv yek caran nizane ka ev stran in an helbest in. Jixwe babetên berhemên devkî gelek dişibin hev loma lêkolîneran re dibe zehmetî ku ka meriv kijan helbesta di binbeşa kijan babetî de tasnif bike. *Heval* ev taybetiyên di xwe de dihewîne ji *delalan* tên veqetandin. Jixve zanista edebîyatên gelêrî her du babetên ev helbestan di binbeşa qewlêrkan de bi cih dikin.

Di vê xebata berdest de jî em ê van di bin navê “qewlêrk”an de binirxînin û tenê li ser qewlêrkên evini, ango *delal*an rawestin.

1.

*Delal ti geriya te dinê dî*
*Te rindikbûn û bilindbûna min keçikê li ku dî*
*Min rindikbûn û dirêjbûna te*
*Li avîyê dî*[13]

[13] H.j.

2.

*Delal ti cot dikî cotê vê avîyê*
*Misasa delêl li dara bîyê*
*Lo delal te sare, were vê paşil ê*
*Te germ e rûne liser çoga min kafirê*[14]

3.

*Ezê welle bi welle kim*
*Ezê sî ciz quran Yasînce kim*
*Her çar gayê mala delêl qelingê mi dernaxe*
*Ezê bennekî bi rêx istiyê xwe kim xwe sivînga mala delêl bi dardaxim*[15]

4.

*Sêreg bişewite gi ax û ci ye*
*Xelkê gî mirazê xwe kiri ye*
*Ez û xelke xwe yê delal*
*Tenê mane li cî ye*[16]

5.

*Heydika malşewitî malê me vana ne*
*Çirê me vêketî ye arê me dada ne*
*Bala xwe didimê hinek diwine bûk û hinek diwine zava ne*
*Delal ti xema nexwe ez û ti li pawka hev û din ma ne*[17]

6.

*Mala xelkê delal li hêlê yo*
*Xwadê yo ti bikî mirazê min û vê zeryê yo*
*Bira qe destê min têkeve kelemçê yo*
*Xewera ku dane min berê delêl dane mapûsxaneya Dîyarbekrê yo*
*Ku di sed û bîst metroya li bin erdê yo*[18]

---

[14] H.j.

[15] JD-2.

[16] JD-1.

[17] JD-1.

[18] H.j.

7.

*Delal qurban ha li hewa heta hewa*
*Li paşila min keçikê firiya zo yê kewa*
*Delalê min mala min şewitand*
*Bi derewa*[19]

8.

*Delal qurban çû me çîya çîyayê asê*
*Tê dengê têfir, çînginî ya dasê*
*Bira dilê min û delêl dil be*
*Ezê têkim istiyê xwe tûrê parsê*

9.

*Mala xelkê min ê delal mala tek o*
*Xal û xarzê qele kirin yek o*
*Diwên bira Xwedê ya bi her du seriya nek o*
*Bira ew jî sî ro rojî bigrin û sê ro eydîyê nek o*[20]

10.

*Kincê delalê min spî ne tu dibê bet o*
*Çilkek qehwe li dawê ket o*
*Min bi heft qaliwê sawûna helebê ava deştê şişt o*
*Dîsa jî lê derneket o* [21]

11.

*Delal xeyidî li bav û dî ya*
*Ket e rêya paş xanî ya*
*Kî here delalê min vegerîne*
*Ezê bidimê heft mehmûdî ya*[22]

12.

*Delal reş e diteyîs e*
*Li xelkê ra ti ne me'eş e*
*Li minra jî him axa û him reyîs e*[23]

---

[19] H.j.
[20] JD-1.
[21] JD-2.
[22] JD-2.
[23] JD-2.

13.

*Ha li Gernê heta Gernê*
*Sîyarê mala bavê min keçikê sîyar bû kela kela germê*
*Ez ne ketim tu qeydan û qusawetê*
*Xelkê delal ê di nav kurk û ewê da bigire sar û germê*[24]

14.

*Li ser me ra kar, li bin me ra mî meriyan*
*Dilê qîzê me yê niha ketiye xortê dewletî ya*
*Xortê me neçara germa havînê man*
*Mîna masiyê li ser çirpî ya*[25]

15.

*Delal bi Heydikê ketim malê me vana ne*
*Çirangê me yê vêketî arê me dadane*
*Dîya min teşîyê risî, li nav mala ne*
*Bavê min keçikê li quncê oda paldane*
*Sîng û berê min keçikê li te ra mixelo ma ne*[26]

16.

*Delal qurban germek bata li ser germê da*
*Tiri bû ye di mêwê da*
*Kelek zer bû di lemê da*
*Bira pezê me keçikê bata li xwodaniyê da*
*Sîng û berê min keçikê ê wirg in*
*Mîna çenaxek mast yek tamarê hingiv tê da*[27]

17.

*Kin o li min kintir o*
*Ti nav qayîş û gisna da vedişêr o*
*Ti li eşîra mala bavê min keçikê*
*Pir çêtir o*[28]

---

[24] JD.h
[25] H.j.
[26] JD-1
[27] H.j.
[28] H.j.

18.

*Kanîka gundê me bin qef o*
*Min av dihanî bi sedef o*
*Ê ku navê  xeklê min ê delêl nizan o*
*Navê xelkê delal mistefa o*[29]

19.

*Oda xelkê delal spî ye ti dibê qe hêk o*
*Ti yeka din li hember wê çêk o*
*Ti bi min palê nek o*
*Bejn û bedena te ez li ber çêk o*[30]

20.

*Delal were mala me nîvan î*
*Te ra jê kim berxê berkozê dolê wî beran î*
*Ku bav û dîyamin gotin ka berxê berkozê dolê wî beran î*
*Ezê biwêm çavê şivana birjê siwê birin êvarê nanîn*[31]

21.

*Delal qurban li ber mala bavê min keçikê nere nê yo*
*Te xuset girêdaye te kiriye rê yo*
*Berî payîzê te ez kut kirim û xistim ber malê yo*[32]

22.

*Delal qurban ti cotarî di kortê da*
*Haletê te şikiya di tokê da*
*Halêt pî ke wîne mala bavê min keçikê*
*Hoste û necar her du tev tê da*[33]

23.

*Delal ti li girê palegirê*
*Arê cixarê min li pê doşkirê*
*Her çar tiliyê min şewitîn bûn komir ê*
*Delêl bo tilîyê min cixare towekir ê*[34]

---

[29] JD-1
[30] H.j.
[31] H.j.
[32] JD-1
[33] H.j.

24.

*Şara serê min didi ne*
*Yekê li ser e yekê li bin e*
*Devê te ne devê jina ne*
*Cawa min keçikê bide*[35]

25.

*Delal li ber mala bavê min keçikê dimeşîya*
*Dûyê cixarê li dû kişiya*
*Min kom û eşîra mala bavê xwe fedî nekira*
*Min ê bigota qutîya te ket, titûna te rijiya*[36]

26.

*Delal qurban çinî pinî*
*Binya mala min pûng çinî*
*Delal li ser min ra hat sekin î*
*Mi go ez bi mêr û ti bi jin î*[37]

27.

*Lê kinê ti kinika ser erdê ra*
*Para dilê min ra ti bostek û çar tilîya li ser xelkê ra*
*Bira ti bûka mala bavê min bû ya*
*Min ê ro yê sê qurban bi da li Xwedê ra*[38]

28.

*Delal qurban ewrek hat û li ser şamê ra*
*Posta hat û mektûw pê ra*
*Mi xwend ku silava mi ne lê ra*
*Mîna ku mektûw were li xelkê ra*[39]

29.

*Kanîya gundê me çitî vitî*
*Bêrîyê gundê me neman bûn şirît î*

---

[34] H.j.
[35] JD-2
[36] H.j.
[37] H.j.
[38] JD-2.
[39] JD.h

*Dilê mi neket e ti kesî, kete bêrîya pêşî*
*Fîstan sor û bervang çît î*[40]

30.

*Ro hilatî hember hîv ê*
*Şewq û şemlê xwe da ye kok a vê bihîvê*
*Xewera xelkê min ê delal didane mi*
*Mektewa xelkê delal ma ye sal û nîvê*[41]

31.

*Hewşa mala bavê mi keçikê dar û gêne ye*
*Bira ûrfa bişewite gi bîne ye*
*Ez qurbana xelkê delal*
*Ku orteokil telebe ye*[42]

32.

*Te li kevirgewrkê mi li kevirgewrkê*
*Me tev lîst kefirê niheberkê*
*Min û delêl li hev hez kir*
*Ew çi ar bû kete dîya xelkê*[43]

33.

*Lawikê delal min dixwaze min bidinê*
*Ser sêla xelkê bi urf û edetê dinê*
*Ku hûn min nedinê*
*Ezê lê ra berdim qirar û soz a revandinê*[44]

34.

*Ha li hîsta hetanî bîsta*
*Bira kîloya nîska rawe sed û bîsta*
*Bira qelingê min keçikê bihata*
*Li wa çar kêlê mala delêl ê nîska*[45]

---

[40] JD.h
[41] JD-2.
[42] H.j.
[43] H.j.
[44] JD-1
[45] H.j.

35.

*Delal cot dikîye li devê rê yo*
*Qeflê keçika di wira dere, dikin nifîrê yo*
*Diwên bira delal bimire*
*Ga herin naxirê yo*[46]

36.

*Delal qurban ba tê ye bayê Axirmanê*
*Bira lê nexe devê qapiyê hepisxanê*
*Heta ku delal li hepsê xûniyan nê berdanê*
*Ez qirika xwe ya boz û beyazî nakim bin herin-nîva wê kitanê*[47]

37.

*Delal qurban mala bavê min keçikê nimê bike*
*Sola dayne mespa pêke*
*Desta veke bana xwedê ke*
*Bê Xwedê yo ti mi zavayê vê malê ke*[48]

38.

*Kiras sorê gul bi gulê*
*Nesekin e li ber devê qereqolê*
*Te lawikê delal har û dîn kir  berda çolê*[49]

39.

*Dihatî şewitîye me gunda, çerçîyê dêr ê*
*Danî kêleka camîyê binya otêlê*
*Qiz û bûkê mena xwe berdan ser, dikirin alûvêra malê dinê*
*Min jî xelkê xwe yê delal re kirrî qawê dabançê qulpê kêrê*[50]

40.

*Oda mala qefûrê hec ahmed têr û tijî*
*Çay û qehwe jê dirijî*
*Destê qehwecî bira bişkê*
*Yek ne da dest delalê min jî*[51]

---

[46] H.j.
[47] JD-1.
[48] H.j.
[49] H.j.
[50] JD-2.

41.

*Tê şevitîyê me gunda titûna şam mîratê*
*Delal qurban min kirrî bi genimê vê leqatê*
*Mi kom û eşîra mala bavê xwe yê giran fedî nekira*
*Minê bavêta oda mala qefûrê hec ahmed ser cimatê*
*Qurbana hûr û girê vê cimatê ku dengê delalê min li nav tê*[52]

42.

*Bira wext bata wexta va dangî ya*
*Bira xelka min a daylan bima pêy gî ya*
*Bira bata ser tirba min*
*Bira bigota rehme li koma van hestî ya*[53]

43.

*Mala delêl li ser kanîyê Xwedê bişewitîne mala neçarî û xizanî yê*
*Delêl sala îsal kir istîyê xwe kulavê şivanî yê*
*Ti şivanê kar û berxa te topraxa Hêrhêrîyê nema daye ber xwe*
*Mala bavê te neçar in bira mala bavê min rehela her du seriya bigire ser xwe*[54]

44.

*Mala delêl bilind e ser du qat a*
*Bejna delêl dirêj e mîna dîregê devê heyat a*
*Sifetê delêl ê wirg e*
*Mîna cama ser seet a*[55]

45.

*Zêza min ê Zêz e*
*Bixçê bigire dakeve binya mala fêza pêz e*
*Guçê orxanê rake ez xwe bavêm bine*
*Bira bê Rebbê alemê kes nizanibe ku em yek in em dudu ne*[56]

[51] H.j.
[52] H.j.
[53] JD-1.
[54] H.j.
[55] H.j.
[56] H.j.

46.

*Hewşa mala bavê min keçikê gi mermer o*
*Delal wêda tê ye xwe bide ser o*
*Ezê li te ra cixarekê bipêçim*
*Ti bide li ser wa lêv ê xwe yê esmer o*[57]

47.

*Te li ser qonaxê bern reng da*
*Mi eywanê şorbe tevda*
*Me li hev û di re*
*Bi leqandina çav û birîya sozek* berda[58]

48.

*Delal qurban bîrê gundê me dudu ne me dudu ne*
*Yek ê şor e yek ê şîrin e*
*Ez û xelkê xwe yê delal*
*Ti diwêjî li ser hev ra jêkirine*[59]

49.

*Delal qurban ti sekinîye ser bizroye*
*Ti hewê tizbîye dijmirî zo bi zo ye*
*Berdêlîya te zaroye*
*Qelingê min keçikê pir e malê bavê te tineye lê dernêye*[60]

50.

*Te çi ser mi da hêle bêle*
*Te ne qelinge ne berdêle*
*Hespa delêl ne kihêle*
*Delal şaş bûye ku çi biviroşe çi bihêle*[61]

[57] H.j.
[58] H.j.
[59] H.j.
[60] H.j.
[61] H.j.

51.

*Baran barî di Xwedê da*
*Av meşîya di qaçanê rê da*
*Bira Xwedê bikira mirazê mirazxwaza gîya*
*Ê min û xelkê delêl jî bira bikira ser û binê vê mihêda*[62]

52.

*Çîya ketim çîya dikir gazî*
*Dara çilo weşand mane şilf û tazî*
*Delal te goştê canê min xwar*
*Ti li hestîkê canê min çi dixwazî*[63]

53.

*Delal qurban mala delêl li hember o*
*Mi delalek didi avêtin ser o*
*Ku ti kihêlo ti binda der o*
*Ku ti bergîr î li binda wur mexelo*[64]

54.

*Delal xeyîdî li jina birê*
*Delal kete rêya pirê*
*Kî here delêl vegerîne*
*Ezê lê ra jê kim gurçika nav a dilê*[65]

55.

*Dilê mi keçikê dilê betê*
*Zêr û zeynetê min ketin nav zerfê û kaxetê*
*Çito sebra te yê were li ser doşegê hukmatê*
*Bê mi tol û hurma xelkê*[66]

56.

*Cotarîyo te çi hor û dor o*

---

[62] JD-2
[63] H.j.
[64] H.j.
[65] H.j.
[66] H.j.

*Te egal xwekiriye da ye hêla por o*
*Devê te ne devê jinaye*
*Te ez xelkê ra nekirama şor o*[67]

57.

*Gayê delêl yek î reş o yekî hişin*
*Berda qûç û qiraca giyakî hişin*
*Dilê mi nekete tu kes î*
*Dilê mi ketiye qutikê delêl aravî hişin* [68]

58.

*Xelkê delal cot dikiye cotê vê birrekê*
*Dismala delêl ket e nav gerrekê*
*Mi kom û eşîra mala bavê xwe fedî nekira*
*Min ê dismal rakira di nav gerrekê*[69]

---

[67] H.j.
[68] H.j.
[69] H.j.

# BEŞA SÊYEM

# JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE ANALÎZA QEWLÊRKÊN EVÎNÎ YÊN GUNDÊ HÊRHÊRIYÊ

Di vê beşê de li ser qewlêrkên berhevkirî dê were rawestandin û ji aliyê teşe û naverokê ve ev qewlêrk werin hilsegandin.

Bi gelemperî hêjmara risteyên qewlêrkan çar in. Lê yên ku ji çar rêzeyan zêdetirin jî hene. Gava meriv hejmara rêzeyên qewlêrkên ku ji gundê Hêrhêrîyê berhevbûyî dinêre bi gelemperî ev qewlêrkên han ji çar risteyan pêk tên. Lê dîsa di nav qewlêrkan de qewlêrkên ku hejmarên wan ji çar risteyan kêmtir in an jî zêdetir in, jî hene. Ji aliyê kêşa kiteyê ve jî ev qewlêrk naşibin qewlêrkên tirkan; çimkî di qewlêrkên tirkan de riste bi heft movikan pêk ten û li gorî vê kêşê tên ristandin. Lê tê dîtin ku di qewlêrkên Hêrhêriyê de hêjmara kîteyan ji vê zêdetir an kêmtir in.

Qewlêrkên Hêrhêriyê ji alîyê serwa û paşserwayê ve xurt in. Jixwe di qewlêrkan de mebesta têmê di herdû rêzên dawiyê de tê gotin, loma ji bo ku qewlêrk ji aliyê ahengê ve neçar nemîne peyvênhevdeng di dawiya risteyan yan serwa yan jî paşserwa çêdikin. Meriv dibîne ku dengê “o”yê, ku kurd gelek ji vî dengî hez dike, di dawiya risteyan de wek serwa an jî paşserwa di gelek qewlêrkan de cih digire. Ev yek jî wisa dike ku kêmaniya ahengê pariyekî temam bibe.

Qewlêrk bi gelemperî helbestên jinan in. Di nav qewlêrkên berhevbûyî de dîyar e qewlêrkên ku ji aliyê jinên evîndar ve hatine rêzkirin ji alîyê hêjmarê ve gelek zêde ne, lêbelê di hin qewlêrkan de tê dîtin ku qewlêrk ji alîyê mêr ve hatiye ristîn yan jî jin bi devê mêrî fikr û ramana wî vedibêje. Jixwe di rêza dawiyê de qewlêrkekê de mêr wisa bang li xuda dike û wiha dibêje “ bira ti bûka mala bavê min ba”.

Qewlêrk ji ber ku ji aliye jinên gund ve hatine afirandin, di şêwaza van berheman de nimûneyên peyvên derbarê çandinîyê wek gisn, halet, ga, cot zêdetir in. Herwiha gava delalî şivan be meriv rastî peyvên kar, berx, ewe(eba)tûr tê. Di qewlêrkan de cihê dûa û nifiran jî bala merivan dikişîne. Di navbera evînekê de qelen wîsa xuyaye dibe bendaveke xurt loma xizanîya delêl berê keçikê dide Xwedê ku

çandinîya delêl zêdetir were û miraza wan pêk were. Yek caran jî sersebaba pêknehatina mirazê wek fêsatî tê dîtin û di rewşên wisa de di destê keça evîndar de ji bîlî nifiran tiştek namîne. Di hin qewlêrkan de meriv dibîne ku fêdî bi aweyekî dî cih digire. Dilê ku bi hesreta delêl dihelin, demên ku tu kes li mal nîn in qîr dikin ku delalê wan werin mala wan û agirê hesretê parîyekî sar bibe. Lê hesreta delêl ya keçik û jinan wisa dike ku di xewn û xeyalan de hin urf û adetên civatê were paşguhkirin û jina evîndar bêyî ku tu sînoran nas bike hemû qedexeyên bin pê dike û kul û kedera xwe vedibêje. Wek mînak jina evîndar dikare ji bo delêl beranê berkozê ser jê kin û gava li wan hesab were pirsîn dê bêjin şivana bir û nanîn. Yek caran di qewlêrkan de meriv şayesekirineke gelekî edebî tê. Wek mînak di qewlerkekê de paşil, sîng û berê ji delêl re vekirî bi aşkera cih digire: “sîng û berê min ê wirgin mîna mastê ku yek tamarên hingiv di nav da”. Hin caran di qewlêrkan de em rastî “delalê bêwefa” jî tên: jina evîndar wisa dibêje “delêl mala mi xera kir bi derewa”. Hinek delalî digel bi delêl ne bawerin jî bi wê hêvîyê bang dikin û dibêjin “bira dilê delêl dil bûya ew razîbûn tûrê parsê yê istû de”. Herwiha di nav qewlêrkan de peyama civakî jî meriv lê rast tê: “Dilê qîzê niha dikevin xortê dewletlîya loma xortê neçar dimînin wek masîyê li ser çirpîya.”

Meriv rastî li evîdarên negihîştine mirazên xwe jî tê. Bi kesên din re zewicî bin jî ew disa delalê hev in.Ger ne wisa bûya delaliyê ma weha digot: “… delal hat li ser min ra sekinî/ mi go ez bi mêr û ti bi jin î.”

# ENCAM

Di vê xebatê em li ser *delalên* evînî yên gundê Hêrhêrîyê sekînin. Di berhevkirina *delalan* de jêderkên sereke jinên gund in. Me bi rêya cîhaza qeydê ya deng ev qewlêrk qeydkirin û piştre deşîfre kirin. Di deşîfrekirinê de qewlêrk ji alîyê rastnivînê ve nehatin nivîsandin. Bi gotineke din, li gorî gotin û bilêvkirina wan me ew nivîsin.

Me di vê xebatê de dît ku qewlêrkên evînî bi gelemperî ji alîyê jinan ve tên vegotin. Li gorî şênîyên gund navê vê cureyê delal in û kesên jêderk jî di dema berhevkirinê de di dewsa têgeha qewlêrkên evînî de, ya delalê bi kar dianîn. Bi hesta evîniyê qewlêrkbêj behsa gelek mijaran dikin. Keçik û jinên evîndar bi rêya qewlêrkan evîn, hesret, kul û keser, meraq û hwd. vedibêjin. Hin caran di van qewlêrkan de rexne li evîndarî tê girtin, hin caran jî lome ji zemanî tê kirin. Digel van yekan meriv dikare bibêje ku wek cureyeke edebiya devkî di qewlêrkan de hezkirin, hesret, bêrîkirin, wislat, rexne û meraq temayên sereke ne. Jina evîndar bi rêya qewlêrkan xem, kul û keser, xewn û xeyal û hwd. vedibêje.

Me di vê xebatê de dît ku di qewlêrkên berhevbûyî de hin urf û adetên civatê hatine paşguhkirin. Jin bi rêya qewlêrkan dikare têkeve dinyaya xewn û xeyalan û bi armanca gihîştina evîndarê xwe dikare rê û rêzikên civatê bin pê bike.

Ji alîyê teşeyî ve me dît ku di van qewlêrkan de hejmara risteyan bi gelemperî çar in, lêbelê ji alîyê hejmarê ve ji van kêmtir an zêdetir jî hene. Herwiha tê dîtin ku di qewlêrkan de aheng bi rêya serwa û paşserwayan ve tê çêkirin. Dengê “o”yê ji bo çêkirina ahengê pir bi aktîf hatiye bikaranîn. Digel vê yekê herçend di hin qewlêrkan de kêşa kîteyî were bikaranîn jî ev bikaranîn ne mîna qewlêrkên tirkan bi heft movikî ne. Pircaran hejmara kîteyan ji heft movikî zêdetir.

Herî dawî mirov dikare bibêje ku berhemên edebiyata devkî hêdî hêdî ji nav gel winda dibe. Divê lêkolîner û xebathezên kurdî bêtir di nav gel de van berheman berhevkin û zêdetir xebatên seheyî bikin; çinku ancex û tenê em xwe dikarin bi van berheman nas bikin. Eger çand û ziman ji holê rabe meriv nikare wek xwe di vê dinyayê de cih bigire.

# ÇAVKANÎ

KAPLAN, Y. (2015). *Kaniya Stranan* (Çapa Yekem). Stenbol: Weşanxenaya Nûbiharê.

KESKİN, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî* (Çapa Yekem). Stenbol: Weşanxaneya Avesta.

Mazi, Ç. (2014). *Baxek Ji Folklora Kurdî* (Çapa Yekem). Stenbol: Weşanxaneya Berbang.

Seçilmek, K. (2019). *Edebîyatê Fekkî Yê Kirmanckî(Zazakî) yê Mintiqaya Sêwregi* (Çapa Yekem). Stenbol: Weşanxaneya Rûpel.

Sezen, T. (2017). *Osmanlı Yer Adları* (Cilt 26). Ankara: T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü.

TDK. (2005). *Türkçe Sözlük (10. Baskı). "mani" maddesi.* Ankara: TDK Yayınları.

# LÎSTEYA KESÊN JÊDERKAN

**JÊDERKA DEVKÎ YA 1.**

**Nav û Paşnav:**Naîle SORUCÎ

**Rewşa Xwendinê:** Nexwende

**Cihê Zayînê:** Hêrhêrî (Çaylarbaşi/SÎVEREK)

**Tarîxa Berhevkirinê:** 09/10/2022- 15/11/2022

**Navê Berhevkar:** Ahmet SORUCÎ

**JÊDERKA DEVKÎ YA 2.**

**Nav û Paşnav**:Rahîme ALTUNTAS

**Rewşa Xwendinê:** Nexwende


**Cihê Zayînê:** Hêrhêrî(Çaylarbaşi/SÎVEREK)

**Tarîxa Berhevkirinê:** 16/11/2022


**Navê Berhevkar:** Ahmet SORUCÎ

## PÊVEK

**WÊNE** 1.


TÜRKİYE CUMHURİYETİ
NÜFUS CÜZDANI
[redacted]
SERİ Z03 № 897634
[redacted]
SOYADI: SORUÇİ
ADI: Sabri
BABA ADI: Mehmet
ANA ADI: Fatime
DOĞUM YERİ: Herneri
DOĞUM TARİHİ: -1928-

**WÊNE 2**



TC

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

**Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

# ÇAYLARBAŞI KÖYÜNÜN AŞK MANİLERİNİN BİÇİM YÖNÜNDEN ANALİZİ

**AHMET SORUCİ**

**22721115**

**Danışman**

**Doç. Dr. Necat KESKİN**

**Mardin-2023**